# Bûjenên benckir – metirsî û bandorên alî

# Lerizîn

## Derbarê vê belavokê

Ev belavok di derheqê **lerizîna piştî benckirinê** ye. Lerizîn bandorek alî ye ku dibe piştî benckira gelemperî yan herêmî bê serê mirov. Ev belavok, sedemên lerizînê û tiştên di derbarê wê de dikarin bên kirin rave dike.


Hûn dikarin li ser malpera me derbarên cureyên bûjenên benckirên bixwînin, ku bi zimanên cuda li vir berdest in: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/translations#languages.

## Lerizîn çi ye?

- Lerizîn berteka xwezayî ya laş li dijî sermê ye. Masûlkeyên di laş de, ji bo ku mirov germ bigirin bi lez dişidin û sist dibin, herwiha ev yek jî dibe sedema lerizînê.
- Lerizîna piştî niştergeriyekê dibe ku nerehetiyek bide mirov, lê ne xeternak e û bi piranî di nav 20-30 deqeyan de disekine.
- Lerizîn dibe sedem ku pêdiviya laşê we bêtir bi oksîjenê hebe. Dibe ku hewcedariya we bi rûpoşek zêde ya oksîjenê çêbibe.

## Çiqas pêkan e ku biqewime?

**Ji her 100 kesî**



**Nêzî 15 dît** **Nêzî 85 nedît**

Ev hejmar ji karên lêkolînan hatine. Hûn dikarin li ser malpera me bibînin me ji ku ev hejmaran girtiye: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/risks/evidence.

## Piştî benckirê çi ji bo lerizînê dibe sedem?

- Dibe ku odeya niştergeriyê sar be. Dema neştergeriyê, hin deverên laşê we serma bigire û ev yek dive germahiya laşê we kêm bike.
- Carinan bandora gaz û dermanên benckirê li ser îşaretên ku di laş de germahiya we kontrol dike çêdibe.
- Lerizîn dibe ku piştî benckira gelemperî yan jî piştî benckira herêmî jî biqewime (epîdural an marîpiştî.

## Tîma nêrîna tenduristiyê dikare çi bike?
Wê hemşîrek piştî niştergeriyê li odeya başbûnê hergav bi we re be. Ew ê germahiya laşê we kontrol bike û betaniyek an vexwirakek germ bidin we.
Heke ev yek ne alîkar be, dibe ku tîm ji bo laşê we germ bibe dermanan an şileyên germ bi rêya demar bidin we.

## Ez bixwe dikarim çi bikim?
Dema hûn li benda çûyina odeya niştergeriyê bin bi qasî hûn bikarin bedenê xwe germ bigirin. Heke hûn beriya niştergeriye bedenê xwe germ bigirin, piştî wê jî ihtimala ku hûn serma bigrin kêmtir be.
Heke serma hîs bikin, hemşîran agahdar bikin ku betaniyên germ bidin we.

Hûn dikarin ji mala xwe re cil û bergen xwe yên germ û şimikên bînin nexweşxaneyê.

## Başe bizanin
Heke we piştî benckirinê lerizîneke tecrûbe kiribe, ev nayê wê wateya ku di pêşerojê de bêtir gengaz e ku hûn wê dîsa tecrûbe bikin.

## Destjêkişandin
Em gelek hewl didin da ko agahiya di vê broşûrê de durist û nûjen bimînin, lê em nikarin ji vê yekê herdem piştrastbin. Em pêşbînyê nakin ko ev agahîyên giştîyane wê persivbin ji bo hemû pirsên we, yanjî çareserî be bo hemû tiştên giring li gel te. Pêwîste hûn li gel koma pizişkî guftûgoyê bikin li ser bijarên xwe û metirsiyên xwe, bi alîkariya vê broşûrê wek rêbîr. Divê ev belavok bi serê xwe wekî şîret neyê hesibandin. Nabe ev broşûr bê bikaranîn ji bo mebestek bazirganî yan sûdkarî. Ji bo Bêberpirsiyarî gişî, zehmetnebi biner (**www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji**).

Hemû wergeran ji alîyê civanta wergervanên Wergervanên Bêsînor (Translators Without Borders) tên çêkirin. Lêvegerîn tê kirin li ser başîya van wergeran ta çêbibi, lê her metirsîya şaştîyan û şaştêgihiştinî heye ji van agahîya.

# Ji me re bêjin ka bê hûn çi difikirin
Em pêşwaziya pêşniyarên ji bo baştirkirina vê belavokê dikin.

Ger têbînîyên we hene ku hûn dixwazin pêşkêş bikin, ji kerema xwe bi riya e-mail bişînin li ser: patiinformation@rcoa.ac.uk

**Royal College of Anaesthetists**
Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG

## www.rcoa.ac.uk

Çapa Şeşemîn, Mijdara 2024
Ev belavok wê di nav sê salên piştî roja weşanê de were nirxandin.

**© 2024 Royal College of Anaesthesists**
Dibe ku ev belavok ji bo çêkirina bûjena agahiya nexweşan were kopîkirin. Ji kerema we, çavkanîya orîjînal binivîsin. Heke hûn dixwazin beşek ji vê belavokê di weşaneke din de bikar bînin, divê destûreke guncaw were dayîn û logo, marka û wêne werin rakirin. Ji bo agahîyên zêdetir, ji kerema we bi me re têkilîyê danin.